

Hefteyên xwendina zimanê swêdî ji bo koçberan (sfi)

Ji bo te ew kesê ku xwendinê diki anjî wê dest bi xwendina sfi biki hefteyên destpêkirina xwendinê û xelaskirinê hatine tayîn kirin. Dema ku em kursekê ji bo te amade bikin, em agahiyên ku te di dema miracaeta sfi de kiribi û danîne cem me ber çav dikin. Xwendina te yî li Welatê te ya berê û ya sfi berê wê ji bo te bibi rêberîya ku gerek tu ji kîjan beşî destpê biki Hefteyên xwendinê ji navbera 30 û heta 48 hefteyan ve pêk tên.

Dema ku mirovan hefteyên xwendina xwe temam kiribin, ji bo wana qarne (not) tên danîn. Li gor tayînkirina Daîreya giştî ya Dibistanan pîvanan qarneyan ji navbera A û heta F tên qerar kirin. Qarneya F tê maneya kû mirov xwe xelas nake. Dema ku ji ber sebebên taybet tu nikaribe kursa xwe xelas biki, heqê te ji bo xwendinê heye ku tu 20 hefteyên zidtirîn bixwîni. Weke xwendevan her tu dikarî zûtirîn wextê xwe sfi xelas biki, û ne mecbûri ku wan hefteyên tayinkirî hemûyan bixwîni. Ji bo te bi xwe li gel Mamosteyê xwe yê sfi li ser rewşa xwe axaftinê biki,

Di dema xwendina tede, wê Mamosteyê te herdem bi tere axaftinê bike, û ji bo pêşketina te li ser zimanê swêdî te taqîp bike. Di van axaftinan de her mirov dikari guhertinên şexsî ji bo te pêk bîne, çalakîyên din anjî xwendinên din ji bo te pêk bînin.

Ew kurs û hejmarên hefteyan di sfi de

1A	1B	1C	1D
48 hefte	40 hefte	30 hefte	30 hefte
	2B	2C	2D
	48 hefte	30 hefte	30 hefte
		3C	3D
		40 hefte	30 hefte

Bi silavên dostanî

Midûr
Perwerdehiya mezinan